Nav eskerên Fransîz ên çûyî Çîné de, yek rê de mir; eşayayên wî teftîş kirin,(27) çekek şêst hezar zêr li ser dîtin; ev mîqdar bedela eşayayê mesrûqe

-
- (6) Fesada wan a li Çîné îcra kirî: Xirabîya wan a ku li Çîné anîne cî, xirabîya wan a ku li Çîné pêkanîne.
- (7) Hemane: Hema hema.
- (8) Çîné: Li Çîné.
- (9) Qîtal: Lêkdan, hevkuştin.
Yexma: Talan. Ev peyvikeka Tirkî ye, ketîye zimanê Kurdî.
Îqa' bîn: Qewimîn, hatin qewimandin.
- (10) Weq'enivîs: Bûyernivîs, kesê ku bûyeran dinivîse û qeyd dike.
- (11) Ev nav, li gora nivîsîna wî ya bi tîpên Erebi hatîye wergerandin bo tîpên Latîni û weha hatîye nivîsîn. Dibe ku awayê wî yê orjînal ê bi tîpên Latîni jî vî awayî cuda be jî.
- (12) Teb' û neşir kirî: Çap û belav kirî, esera xwe ya ku çap kirîye û belav kirîye, esera xwe ya ku çap kirîye û weşandîye.
- (13) Temamen: Bi tevayî.
Îtîraf dike: Li xwe tê mikurê.
- (14) Dudu ne: Didu ne, du tişt in.
- (15) Menfeet: Lişt.
- (16) Bi hîmaya Fransayê: Bi parastina Fransayê, di binê parastina Fransayê da.
- (17) Xîlafê edl û însanîyet: Çewtê edaletê û mirovîyê, li dijê edaletê û mirovîyê.
- (18) Dewletên muttefiq: Dewletên hevgerî. Mexsed dewletên Ewropayê ne.
- (19) Xebebe li Çînyê kir: Zora Çînyan bir, Çînî zorbirî kirin.
- (20) Mîsyoner: Belavkarên dîne Fîletîyê, kesên ku diçin hin welatên ne File û dixebitin ku dîne Îsa di nava gelên wan welatan da belav bikin.
- (21) Delalet: Rêbirî, rênişandan.
- (22) Telqînat: Piranîya "telqîn" e, ew jî bi mana "îqna'kirin" û "propagande" ye.
- (23) Emwal: Piranîya "mal" e.
- (24) Tanî: Danîya.
- (25) We îtîqad dikir: Wisa bawer dikir.
- (26) Emel: Kar.
- (27) Eşayayên wî: Tiştên wî.
Teftîş kirin: Qontrol kirin.

bî.(28) Hasilî, gelek emsal û ehwalên(29) dî kifş kir ku mîsyoner, van wuqûatê mu'lîme de sebebek musteqil bîn.(30)

Ew tefsîlat tayîn dike ku(31) ev mîsyonerên ha, meqseda wan a eslî ew e menfeeta xwe digerin; dewletên Ewropayê jî, meqsedên xwe yê nameşrû(32) re wan dikin alet.

*

Gelek wuqûatên dî îsbat dike ku muamelatên(33) mîsyonera temamen bi musaada wuzerayên(34) wan dibe. Îxtîlafa nav hukumeta me û Fransayê de teheddus kirî,(35) bi sûretek we netîcepezîr bî(36) ku, ew pênc şeraitên(37) li me dayin qebûlkinin,(38) paşayika halê Kurdistanê de gelek muzir e.(39) Ew pênc şerait jî ev in:

1- Qebûlkirina hemî mektebê(40) Fransîz ên li milkê me mewcûd(41) û muafiyeta wan ji bacê(42)

2- Qebûlkirina hemî mebanîyuddîn û xestexaneyên(43) mewcûd û muafiyeta wan ji gumrikê.

3- Tamîra(44) hemî mekteb, xestexane û emakinên saîre(45) yên li salên 1894, 95, 96'ê de weq'a Ermenîya texrîb û an zererdîde bûyîn.(46)

(28) Mesrûqe: Dizîkirî, tiştê ku hatîye dizîn.

(29) Hasilî: Dûwayîka peyvê, bi peyveka kurt.
Emsal: Piranîya "mîsal" e, ew jî bi mana "numûne" ye.
Ehwal: Piranîya "hal" e, ew jî bi mana "rewş" e.

(30) Wuqûatê mu'lîme: Bûyerên azarde, bûyerên ku azar didin mirov, bûyerên ku mirov dêşîn.

Musteqil: Serbixwe, xweser.

(31) Tefsîlat: Qalkirina hin bûyeran bi awayekî dirêj û fire.
Tayîn dike: Nîşan dide, kifş dike, tîne ber çavan.

(32) Nameşrû: Nebicî, neheq.

(33) Muamelat: Piranîya "muamele" ye, ew jî bi mana "deskarî, tevger, kar" e.

(34) Wuzera: Piranîya "wezîr" e.

(35) Teheddus kirî: Peyda bû.

(36) Bi sûretek we: Bi awayekî wisa.

Netîcepezîr bî: Netîcede bû, dûwayîkde bû, netîce û dûwayîk da.

(37) Şerait: Piranîya "şert" e, ew jî bi mana "merc" e.

(38) Li me dayin qebûlkinin: Bi me dane qebûlkinin.

(39) Paşayik: Paşî, dûwayî.

Muzir e: Zîyande ye, zîyan dide, zîyan tîne.

(40) Mekteb: Dibistan.

(41) Milkê me: Welatê me.

Mewcûd: Heyî, tiştê ku heye.

(42) Muafiyet: Azadkinin.

Bac: Bêş, diravên ku dewlet ji hin sazgehan û kesan distîne.

(43) Xestexane: Nexweşxane.

(44) Tamîr: Veavakirin, veçêkirin, ku mirov avayîyek yan jî tiştêkî dî yê ku hinek cîyên wî xira bûne, ji nû ve ava bike yan çêke.

(45) Emakinên saîre: Cîyên dî.

(46) Zererdîde: Zirardîtî, xesardîtî.

4- Her car wekî(47) hukumeta Fransayê dest kir bînanê însa û an bike mewcûd tamîr û an tewsi' bike,(48) heger heta şeş heyva hukumeta me tu îtîraz teblîx nekir,(49) êdî tu heqê îtîraz ji me re namîne.

5- Wek Fransayê divê, tesdîqa întîxaba(50) Emanuel rahibîya Keldanîya re.(51)

*

Ji van her pênc madda kifş dibe ku, ew mesleka(52) Fransa li Kurdistanê ta-qîb dike, îstîqbalê de Kurdistanê de wê gelek mudhiştir(53) bibe û mîsyonerên wê derê, yekcar bi van şeraita mutlequl'înan(54) dibin. Fransiza, mîsyoner ji welatê xwe derkirin. Lakîn ew muhsid nuho çûn li milkê me, wê derê bi hîmaya Fransiza de ne. Bînaen'eleyh,(55) Fransiza tu qencî însanîyetê re nekir. Ew bela rêkirin ser çavê masûmên Anadolîyê; û Fransayê bi quwwe-tulbehra(56) xwe hew qas îmtîyaz(57) da mîsyonera ku, paş nuho qîtalên gelek xwînrejî zuhûr bikin.(58) Çi qas muessesatên(59) Fransayê welatê me he-ne, hemî destê mîsyonera de ne. Ew jî ya wê xelqên cahil bînin ser dîne xwe, û an yên neyên ser dîne wan, wê bi îfsad û teşwîqa wan(60) bi destê tewabiên wan bèn qetilkirin.(61)

Hasilî, Kurdîstana reben, mehza bi tedabîrên(62) Fransayê û bi îttîfaqa

(47) Wekî: Dema ku, wextê ku.

(48) Li vir têkilhevîyek heye, wisa tê zanîn ku ev têkilhevî ji şaşîya rêzîkirinê qewimîye. Bi dîtina me, awayê rast weha ye: "Her car wekî hukumeta Fransayê dest pê kir ku bîna-yek însa û an a mewcûd tamîr û an tewsi' bike". Mana wê jî bi Kurdeyîka xwerû weha ye: "Her car dema ku hukumeta Fransayê dest pê kir ku avayîyek ava bike û yan yeka heyî veava bike û yan jî fire bike".

(49) Teblîx nekir: Neda zanîn, neda dîyarkirin.

(50) Tesdîq: Qebûlkirin û qencdêrana tiştek, karek, tevgerê; ku tiştek, karek, tevgerê ji alîyê meqamên resmî ve yan ji alîyê kargêrê ve bê qebûlkirin û qenc bê dêran, ew me-qamên resmî yan jî ew kargêr ji wî tiştî ra yan ji wî karî ra yan ji wê tevgerê ra bêje "erê" û qebûl bike, qenc bidêre.

Întîxab: Bijartin.

(51) Rahibîya Keldanîya: Keşetîya Keldanîyan, keşetîya Fileyên Keldanî.

(52) Meslek: Rê, awa, tevger.

(53) Îstîqbalê de: Di pêşedemê da.

Mudhiştir: Zêdetir bitirs, zêdetir azarde, zortir.

(54) Mutlequl'înan: Serberadayî, serazad, serbest.

(55) Bînaen'eleyh: Li ser vê yekê, ji ber vî semedî.

(56) Quwwetulbehr: Hêza deryayî ya ku ji gemîyên eskerî pêktê.

(57) Îmtîyaz: Girtina bi ser hinekên dî ra, ku mirov kesek yan hin kesan yan jî hêzek yan jî hin hêzan bi ser ên dî ra bigire, bixe pêşîya wan.

(58) Zuhûr bikin: Dîyar bibin, peyda bibin, biqewimin.

(59) Muessesat: Piranîya "muessese" ye, ew jî bi mana "sazgeh" e.

(60) Îfsad: Xirabkirin, şopandin, avarêkirin, derxistina ji rîya rast.

Teşwîq: Fîtkirin, hewisandin, ku mirov hin kesan jibo tiştek fît bike û hewes têxe dilê wan, wan jibo wî tiştî bihewisîne, hewes bide wan.

Wan: Mîsyoneran.

(61) Tewabiên wan: Pêgirtiyên wan, pêgirtiyên mîsyoneran, hevalbendên wan.

Bèn qetilkirin: Bèn kuştin.

(62) Mehza: Tenê, sirf.

Tedabîr: Piranîya "tedbîr" e.

Rûsyayê, qîtalên gelek mudhiş re musteqbelen muheyya maye.(63) Û ji vî rûyî, ew Ermenî û Kurdên hinde zemana wek bira îmtîzac kirin,(64) paş nuho heta hevdû xilas bikin wê ji mîsyonera re xizmet bikin.

Mîsyonerên welatê me, mirovên îxfal kirîn(65) her teşwîqê herekatên we(66) dikin ku, nîhayetê de(67) faîdeyek ji hukumetên wan re derkeve. Wekî mirovên wan de(68) dest tecawuzê(69) kir, mileta li ser wan hakim bîttebi'(70) wê heqaretê tehemmul nake; ew jî dest davêje çek û bi saiqa(71) ern û şiddetê, ji luzûmê zêdetir digire dikuje. Loma namê me(72) bê heq zalim û xeddar derdikeve. Lakîn esil mutesebbib(73) hinên dî ne; yanî mîsyoner û eşxasên îxfalkirî ne.(74) Çi qasî qîtal bîne, her wekî em tehqîq(75) bikin em'ê bibînin ku nav meseleyê de mîsyoner û murewwicên efkarên wan xwe îzhar dikin.(76)

*

Ev hucûm û ev xedra mîsyonera û hukumetên wan, hemî ser wî xelqî ye ku ji rûyê zulma Ebdulhemîd ji berê ve jar û reben mane. Lakîn benîadem xilqeten întîqamcû ye.(77) Ne mirovên wek Kurda bi pirrî cahil, hetta eqwamên sahibmarîfet jî(78) nikarin binê tehqîrê de bimînin. Loma Kurda jî heyfa xwe kir.(79) Hew qas zeman e Ermenîya tecawuz li Kurda nedikir. Bînaen'leyh Kurda jî wan re qenc îmtîzac dikir. Eve çend salek e îmtîzacê qedîm(80) temamen muxtel bîye.(81) Bînaen'leyh sebebek heyê, ew sebeb jî fesda mîsyonera ye.

-
- (63) Musteqbelen: Di pêşdemê da.
Muheyya ye: Amade ye, hazir e.
- (64) Îmtîzac kirin: Pêkve jîyan, digel hev jîyan, pêkve bûn.
- (65) Îxfal kirin: Xapandin, kesên ku mîsyoneran ew xapandin.
- (66) Herekatên we: Hereketên wisa, tevgerên wisa.
- (67) Nîhayetê de: Di paşîyê da, di dûwayîyê da.
- (68) Mirovên wan de: Bi dîtina me peyvika "de" zêde ye û bi şaşîya rêzkirinê li vir derketîye, awayê rast "mirovên wan" e. Yanî "mirovên mîsyoneran, pêgirtî û hevalbendên wan".
- (69) Tecawuz: Desdirêjî.
- (70) Bîttebi': Tebîî, jixwe, bi awayekî tebîî.
- (71) Saiq: Hêza pêjnî ya ku ji dilê mirov dikele û mirov ber bi tiştek daf dide.
- (72) Namê me: Navê me, navê Kurdan.
- (73) Mutesebbib: Kesê ku dibe sebebê tiştek, rê dide karek, şolek.
- (74) Eşxasên îxfalkirî: Kesên xapandî, kesên ku hatine xapandin.
- (75) Tehqîq: Lêgerîn.
- (76) Murewwicên efkarên wan: Kesên ku dîtînin wan direwînin, dimeşînin, belav dikin, kesên ku jibo cigirtina fikrên wan dixebitin.
Xwe îzhar dikin: Xwe eşkera dikin, xwe nîşan didin, derdikevin meydanê û dîyar dibin.
- (77) Întîqamcû: Tolexwaz, kesê ku dixwaze tole bistîne.
- (78) Sahibmarîfet: Xwedîmarîfet, xwedîzanîn, serwest, zana.
- (79) Heyfa xwe kir: Heyfa xwe stand, toleya xwe stand.
- (80) Îmtîzacê qedîm: Jîyana pêkve ya berîn, jîyana wan a digel hev a berîn.
- (81) Muxtel bîye: Xilxilîye, verisîye, bişkifîye, xira bûye.

Zemanê Teymûr Leng(82) Rûsyayê divîya ji Qafqasyayê tecawuzê Kurdistanê bike; Ermenîya ji hevalên xwe yê Musulman zêdetir Kurdistan mudafea kir. Eve ji van delîla jî malûm dibe ku ev nîfaqa îro, ne ji sebebek dîger e;(83) netîca meseleyê de, wekî hukumetên Ewropayê dawa dikin, em dibînin ku her merkeza teleba wan, ser menfeeta xwe, tebee û mîsyonerên xwe ye,(84) ne xwîna Ermenîya ye.

Paş şerê dewleta me û Rûsyayê, ew muaheda li Berlînê hat eqidkirin,(85) Rûsyayê şeraitên we dan qebûlkirin ku, eve bîst sal e ji rûyê wan şeraita li hemî derê milkê me de eve bîst sal e qîtal kê m nabe. Paş wî şerî, paş wê muahedeyê, me Qanûnê Esasî(86) îlan û qebûl kiribî. Lakî Rûsyayê dizanî ku ew heqê me de xêr e, loma li Xunkarê me da lexûkirin.(87) Muaheda Berlînê de hin şerait hene ku, heger me ehkamê(88) wan temamen îcra bikira,(89) welatê me de nîfaq û fesadê zêdetir bibîya. Gelek mewaddên(90) wê muahedeyê, sebaba fesada nav xelqê dewleta me de ye. Hingî ev halê nîfaqê dewam bike, em'ê bê-tir kê m bikevin.

Vê carê Fransayê jî ev rîya Rûsyayê ji xwe re girt.(91) Mesela paşayikê de ewê jî pênc şertên dî li hukumeta me da qebûlkirin. Ji rûyê wan şeraita, zemanekî yi(92) ew Asyaya weqtekî me'hedê tefeyyuz,(93) wê bîye mezbehek, melhemek we(94) ku dinê hê emsal nedîtî.

-
- (82) Teymûr Leng: Padîşahê Moxol bû. Nevîyê Cengîz bû. Di sala 1336'an da li Tirkistanê li bajarê Keş hat dinê. Piştê ku çû ser text, dest bi dagirkirina welatan kir. Îran, Sûriye, Misir, Îraq dagir kirin, di 1386'an da Bexda wêran kir, paşê Mosqwa dagir kir û berê xwe da dewleta Osmanî, di 1402'yan da di şerê Enqerê da Padîşahê Osmanîyan Bayezîdê 2'yan ê bi navê "Birûsk" naskirî, zorbirî kir û dîl girt. Serbajarê dewleta wî Semerqend bû. Di sala 1405'an da li wir mir. Gora wî li wir e.
- (83) Sebebek dîger: Sebebek dî, semedekî dî.
- (84) Yanî "tim merkeza daxwaza wan, giranîya daxwaza wan li ser menfeeta wan e, li ser pêgirtîyên wan e û li ser mîsyonerên wan e".
- (85) Şerê dewleta me û Rûsyayê: Şerê Osmanîyan û Rûsyayê yê ku di salên 1877—1878'an da qewimî. Muaheda li Berlînê hat eqidkirin: Peymana ku li Berlînê hat pêkanîn, hat îmzakirin. Ew peyman di sala 1878'an da, hema piştê kutabûna şer pêkhat.
- (86) Qanûnê Esasî: Serqanûn, qanûna bingehî ya ku awayê kargêrîya dewletek, heq û wezîfeyên hevvelatên wê sererast dîke û kifş dîke. Di dewra Osmanîyan da ji serqanûnê ra dihat gotin "Qanûnê Esasî".
- (87) Li Xunkarê me da lexûkirin: Bi Xunkarê me da lexûkirin, da hilanîn, da rakirin.
- (88) Ehkam: Piranîya "hukm" e.
- (89) Îcra bikira: Pêkbanîya, banîya cî.
- (90) Mewadd: Piranîya "madde" ye.
- (91) Di eslê nivîsarê da ev peyvika "girt" û peyvika "kirin" a di paşîya peveka pey vîya da, bi şaşî cî bi hev guhartine; li vir "ji xwe re kirin", li wir jî "qebûlgirt" derketîye. Me ew şaşî rast kir û her du peyvik jî bi awayê rast nivîstîn; me li vir "ji xwe re girt", li wir jî "qebûlkirin" nivîstî.
- (92) Zemanekî yi: Zemanekî ye, demek e.
- (93) Me'hedê tefeyyuz: Cîyê feyzê bû, cîyekî wisa bû ku bi feyza xwe, bi xêr û bêra xwe hati-bû naskirin.
- (94) Wê bîye mezbehek, melhemek we: Wa ye bîye qesabxaneyeka wisa.

Hasilî, çara van bela hemîya Qanunê Esasî ye. Weqta ku welatê me de ev qanûn teessus kir,(95) êdî wê hingê xelq hemî ji huqûqên xwe emîn dibe, teselluta Xunkarê mustebid(96) û me'mûrên wî namîne û êdî mîsyoner jî îfsada xelqê re tu çara nabînin, hetta duwelê ecnebîye(97) jî mudaxele muamelatên me(98) nakin.

Berî sih û pênc sala dewleta Japonyayê jî marûzê mudaxelatên duwelê ecnebîye bî.(99) Lakîn ji wê hingê ve îdara xwe kir binê întîzamê û bi vî sûretî xwe ji teerruza ecaniba xilas kir.(100) Îro ji xunkarê wan heta kêmtirê wan, hemî ber qanûnê wekhev, musawî ne.(101)

Divê em jî wek wan bikin, da em xwe ji neyarên xwe xilas bikin. Çara vê jî ew e, xwe divê em zulma xwe îzale bikin,(102) da sebebê mudaxeleye nemîne.

(95) Teessus kir: Saz bû, bicî bû.

(96) Tesellut: Desdirêjî, zordestî.

Xunkarê mustebid: Padîşahê dîktator.

(97) Duwelê ecnebîye: Dewletên bîyanî.

(98) Mudaxele muamelatên me: Têkilîya karên me, têkilîya şolên me.

(99) Marûzê mudaxelatên duwelê ecnebîye bî: Li pêşberê têkilîyên dewletên bîyanî bû, ji têkilîyên dewletên bîyanî ra bûbû amanc.

(100) Îdara xwe kir binê întîzamê: Kargêrîya xwe kir binê dûzenê, kargêrîya xwe xist dûzenê, îdara xwe bi dûzen û qanûnê ve girêda.

Bi vî sûretî: Bi vî awayî.

Xwe ji teerruza ecaniba xilas kir: Xwe ji êrîşa bîyanîyan rizgar kir, xwe ji hucûma bîyanîyan filitand.

(101) Musawî ne: Wekhev in, di navbera wan da wekhevî heye.

(102) Yanî "divê ku em bi xwe zulma xwe ji meydanê hilînin, rakin, dûwayî li zulma xwe bînin".

ZÎN Û MEM

DEWLET Û TEQRÎRA REMMALÎ JÏBO PÎRÊ(103)

Ew warisê ilmê Daniyalî(104)
gava fikirî di şeklê falî

fîlhal-i di rehmê ummehatan(105)
bê wez'ê tewelluda benatan(106)

lehyan û neqîyyê pêkve dîtin(107)
Tacdîn û Sitîyyê pêkve dîtin

şeklê ferehê digel xemê dît(108)
bê perde wî Zîn digel Memê dît

Ev renga he gote qasida pîr:
"Meqsûd-i bi mekr û kîzb û tezwîr(109)

ma qet dibitin jibo te hasil!(110)
Bê rasterewî muhal e menzil(111)

-
- (103) Yanî "dewlet û qalkirina falavêj jibo pîrê". Mexsed ji "pîrê", dayeya Sitî û Zînê ye. Ev, nivê sernivîsara vî beşî ye; temamê sernivîsarê, li gora çapa Stanbolê ya 1919'an weha ye: "Dewlet û teqrîra remmalî jibo pîrê, muwafiqê ma fîddamîr û muxalifê teqrîrê". Mana wê jî weha ye: "Dewlet û qalkirina falavêj jibo pîrê, li gora nîyeta dilê wê û li çewrê qalkirina wê".
- (104) Warisê ilmê Daniyal: Warisê zanyariya Danyal. Danyal, pêxemberekî Cihudan bûye. Tê gotin ku fal ji wî maye.
- (105) Fîlhal: Tawil, di wê gavê da, hema wê gavê. Ummehat: Piraniya "umm" e, ew jî bi mana "dê, dayik" e.
- (106) Yanî "berî welidîna keçikan, berî ku keçik welidîbûn". Mexsed ji "keçikan", her du xuşk Sitî û Zîn in.
- (107) Lehyan: Her du alîyan. Neqîyy: Paqij.
- (108) Fereh: Kêfxweşî.
- (109) Meqsûd: Tiştê daxwazkirî, amanc, tiştê ku mirov wî daxwaz dike û divê wî bi destê xwe bigîhîne. Mekr: Dek, hîle. Kîzb û tezwîr: Derew.
- (110) Hasil: Desketî, tiştê ku dikeve destê mirov. Mana wê malikê digel malika berîn pêkve weha ye: "Ma bi dek û derewan daxwaza te qet bi destê te dikeve!"
- (111) Rasterewî: Rewîna rast, meşa rast a bê fetl û fitûl. Muhal e menzil: Bêmikûn e gîhaneke, ne mimkun e ku mirov bigîje gîhanekek. Yanî "eger mirov rasterê neçe û rast li rê nemeşe, bêmikûn e ku mirov bigîje gîhanekek".

Te d'go ku kurêd-i min di dîn in
Nabêjîye min Sitî û Zîn in

Roja we ku çûne geşt û seyran
wan dîne li rê du dîdeheyran(112)

Yanî du kurêd-i serweqamet(113)
Rabûye li wan kuran qiyamet

Fîlhal-i evan du afîtaban(114)
dil çûye ve bal du mahîtaban(115)

Ew bûne ji îşqê van di bêhûş(116)
ev bûne ji husnê wan di medhûş(117)

Ev şîfeteê belayê îşq in(118)
ew teşneê Kerbelayê îşq in(119)

Ev xatemeşêd-i wan kuran in
van jî du nigîn di destê wan in

Çawa xemilîne ev kuranî(120)
ew jî gerîyane cilkeçanî”(121)

(112) Dîdeheyran: Kesê ku mirov ji çavê wî ra heyran dimîne, çavxweşik.

(113) Serweqamet: Kesê ku bejna wî wek bejna dara serwê zirav û dirêj e, bejnzirav.

(114) Afîtab: Roj. Mexsed Sitî û Zîn in.

(115) Mahîtab: Tavehîv. Mexsed Tacdîn û Memê ne.

(116) Îşq: Evîn, eşq.

Bêhûş: Bêhiş.

(117) Medhûş: Gêj, serlêgerîyayî.

(118) Şîfete: Nexweşê evînê, kesê ku ji ber evînê nexweş ketîye. Eslê peyvikê ”şîfte” ye, jibo wezna helbestê li vir bûye ”şîfete”.

(119) Teşne: Tî.

(120) Kuranî: Wek kuran, wek lawan, bi awayê kuran, kurkî.

(121) Cilkeçanî: Di cilên keçan da, bi cilên keçan, wergirtîyên cilên keçan, kesên ku cilên keçan wergirtine.

KÜRDİSTAN'DA ESAS-I NİFAK

Süt-re-i riya ve insaniyete bürünmüş Jezvit(122) papaslarının, Avrupa'nın cihât-ı muhtelifesinde bâis oldukları fesad-ü şikak mülabesesiyle hemen her memleketten koğuldukları halde, gerek Aksa-i Şark'ta ve gerekse Şark'ta ve hususiyle Okyanus adalarında nüfuz-ü tahakkümü dest-i inhisara aldıkları, hakayık-ı sabitedendir. Maksud-ı aslîleri, cahil ve gafil yaşayan hemcinslerini serair-i diniyeye agâh etmeyerek pençe-i istibdad-ü tagallüblerinde ezmek ve bu suretle semere-i mesaîlerini zerre kadar ta'b-ü meşakkate duçar olmaksızın hazine-i esrarengizlerine cem'etmekten ibaret olan bu kabîl memurîn-i ruhaniyenin mülk-i Osmanîde insaniyet ve medeniyet namıyla îka' ettikleri fazayıhtan evvel, haklarında daha kat'î ve celî malûmat verebilmek azmiyle, kıtaât-ı meskûnenin en baîdlerinde çevirmekte oldukları dolab-ı fesad ve intifai tasvir ve izah, herhalde faidesiz addolunmaz.

Çin muharebâtının misyonerlerin tahrikâtıyla vaki olduğu ve neticenin de yalnız onların menafi-i keyfiyelerine muvafık surette takarrur ettiği, birçok muharrirler tarafından yazılıp durmakta ve meselâ bu muharebelerde vakanüvislik memuriyet-i resmiyesiyle bulunmuş olan Baron Bazan-kor,(123) "Çin ve Kuşanşin Muharebâtı" namıyla yazdığı eserde, "hükümet-i semaviyenin(124) kapılarını lâyenkatı' sarsan iki müdhiş düşmandan birisi menafi-i ticariyenin temini için İngiltere tarafından edilen tazâyık-i maddî, diğeri de Fransa himayesiyle devam ve icra olunan neşriyât-ı diniyedir" mukaddimesiyle başladığı sahifelerde, misyonerlerin ne insaniyetşiken menfaat ve denaetler irtikâb etmekte olduklarını beyan ediyor ki Fransa generallerinden Waro'nun(125) raporu da bu beyanatı aynıyle, anane-siyle tasdik etmektedir:

"Çin'de ahalînin kıymetli emval ve eşyasını ilk yağma ve garet ve bu hususta askerlere rehberlik eden, misyonerlerdir. Bunlar müddet-i medîde Pekin'de oturdukları cihetle, altun külçelerinin mevzu oldukları bankaları tanyıyorlardı. Muhasara kalkar kalkmaz askerlerimizi bizzat sevk ettiler ve Hristiyan dinine idhal ettikleri Çinlileri bunların yanlarına katarak en gizli

(122) Jezvit: Hristiyanlığın bir mezhebi. Türkçede "Cizvit" biçiminde yazılır. 1540 yılında İgnatius de Loyola adlı bir papas tarafından kurulan bu mezhep, mensubu bulunan papasların yaptıkları kötülükler yüzünden Avrupa'da fazla mensup bulamamış ve fazla yayılamamıştır. Sonra, mezhebe bağlı papaslar Doğu ülkelerine yönelmişler ve birçok ülkede kiliseler yapmışlar, mezheplerinin propagandasını yaparak o ülkelerdeki mensuplarını çoğaltmaya çalışmışlardır. Mezheplerinin adı, "İsacılar" anlamına gelir.

(123) 20. sayıdaki 9 numaralı dipnota bakınız.

(124) Hükümet-i semaviye: Semavî hükümet, göksel hükümet. O hükümetin neden böyle nitelendirildiği konusunda elimizde bir bilgi yoktur. Belki de "semaviye" sözcüğü yazının aslında yanlışlıkla böyle çıkmış ve doğru biçimi, "Çin hükümeti" anlamına gelen "hükümet-i Siniye"dir.

(125) 20. sayıdaki 9 numaralı dipnota bakınız.

köşeleri araştırtılar. Bu Çinliler, misyonerlere yardım ederek ve gasb-ü sirkat ettikleri emvalı ruesa-i ruhaniyenin ellerine teslim eyleyerek, Cenab-ı Hak indinde hayırlı ve mukaddes bir iş yaptıklarına kani idiler.

İşte bizim askerlerimiz ve bahriyelilerimiz, bu sayede zengin oldular. Kıymetli şeyleri mahallerinde satarak, Fransa'ya Pekin'de aldıkları büyük miktarda çeklerle avdet eden bu yağmacılardan birisinin yolda vefat etmesi, hayli esrarın meydana çıkmasına yardım etti. Muharebe hitamında Fransa'ya dönen kıtaâttan birisine mensub bu neferin vefatını müteakib alelusul evrakı araştırılırken, Fransa'da tediye olunmak üzere Pekin Piskoposu Fawye(126) tarafından mumza, altmış bin franklık bir çek çıkar; ki bu sayede, tarîk-i hakî irae maksadıyla neşriyât-ı muğfilede bulunan papasların, Çinlilerin hukuk ve servetine edilen taarruzdan başka, askerlerde ve umumiyet üzere insanlarda mevcudiyeti elzem hakşinaslığı ve dolayısıyla ahlak-ı fâzılayı ifsad ettikleri, bu halleri bîtarafane görenler nazarında tamamen tezahür etti”.

Okayanus adalarındaki istibdad-ü ifsadları Aksa-i Şark'takinden daha fena olup, âdeta oralarda yaşayan zavallıları emr-ü nehyelerinin mahkûmü etmekte ve toprağı feodalite devrindeki cebr-ü şiddetin daha müdhiş bir tarîkiyle sürdürmekte oldukları, Jorj Peren(127) namındaki muharrir-i dakikaşınasın raporları ile müeyyed ve musaddaktır.

*

Bu mukaddimâtı serd etmekten maksad, Avrupa'nın ekser-i hükümetleri arazisinden bir buğz-ü nefret ile tard edilen misyonerlerin, cihanın kıtaât-ı sairesine şerare-i fesad gibi yayıldıklarını anlatmak ve insaniyet-ü medeniyet namıyla hareket eden Avrupa hükümetlerinin eydi-i siyaset ve nüfuzlarında nameşru bir vasıta-i müdahale ve intifa' olduklarını izah etmektir. Misyonerlerin ızrar-ı ibaddaki meslek-i sakîmleri, kendi dindaş ve vatandaşları tarafından nazar-ı dikkate alındığı halde, Avrupa'dan başka mahallerdeki insanları ifsad etmek fikr-i sahîfini yine o vatandaşların meclis-i mebusanlarda, umumî ve hususî konferanslarda saklayamadıkları, matbuâtın her gün ifşa ettiği dosyalardan, delillerden mütezahir olmasına nazaran, Devlet-i Aliyye(128) ve Fransa beyninde, mütekevvin rıhtımlar ve sair ihtilâfâtın misyonerlerin menfaatına muvafık olarak Osmanlı şeref ve şanını muhill, aşağıda muharrer beş madde ile 10 Teşrin-i Sanîde(129) hitam bulmuş olması, Kürdistan'ın âtîsi noktasından pek mühliktir:

1-Osmanlı toprağındaki Fransız mekâtib-i hazırasının mevcudiyet-i kanuniyelerinin tanınması ve mer'iyül'icra muahede ve kanunlar mucibince gümrük resminden muafiyetlerinin muteber tutulması.

(126) 20. sayıdaki 9 numaralı dipnota bakınız.

(127) 20. sayıdaki 9 numaralı dipnota bakınız.

(128) 28. sayıdaki 125 numaralı dipnota bakınız.

(129) Teşrin-i Sanî: Kasım ayı.

2- Fransız hastahaneleriyle ebniye-i diniyesinin mevcudiyet-i kanuniyelerinin tanınması ve keza mer'ıyyül'icra muahedât ve mukavelât mucibince arazi ve gümrük resimlerinden muaf tutulması.

3- 1894, 95, 96 senelerinde memalik-i Osmaniye'nin muhtelif cihetlerinde ve İstanbul'da tahaddüs eden Ermeni vak'alarında harab olan veya zarara uğratılan Fransız mekteb, hastahaneler ile emakin-i diniyenin inşa, tamir ve tevsî'lerine müsaade olunması.

4- Fransa hükümetinin âtiyen îcabına göre yapmak isteyeceği müessesâtın tevsîat, inşaat ve tamiratın başlangıcından itibaren geçecek altı ay esnasında hükümet-i Osmaniyece mucib-i şübhe bir şey hissolanarak şayed itiraz edilmeyecek olursa, bu teşebbüsâtın da re'sen müsaadeli add-ü itibar olunması.

5- Keldanî(130) patrikliğine müntahab Emanuel'in memuriyet-i ruhaniyesinin Fransa'nın arzu ve talebi vechile bil kabul tasdiki.

Fransa'nın Şark'ta kapitülasyonların(131) kabul ettirilmesinden beri takib ettiği meslek-i siyasî-i dinînin şüun-ı Kürdistan'da istilzam eylediği müdahalâtın müstakbelde daha müdhişleri îka' edileceğini vazihan isbat eden şu beş maddenin hemen her noktasından Katolikliğin, misyonerlerin son derece bir sahabet ve himayete mazhar edilmiş oldukları hiss-ü derk olunur.

Serbestî-i vicdanın umumen muteber tutulduğu şu asr-ı medeniyette Ak-sa-i Şark ve Okyanus cezairi gibi dinî müdahalât ve münakaşâta makarr-ü memerr olan vatanımızda da Jezvitlerin kanun-ı mahallî fevkına bir kuvve-i bahriye vasıtasıyla ı'sad edilmeleri, üçüncü maddede zikredilen, 1894 tarihinde başlamış dehşetli kıtaların bundan böyle daha şiddetle zavallı Şark ahalisine cebren taslît edileceğini işrab ediyorum.

Fransa'dan koğulan misyonerler, başka yerlerde icra-i mefsedet ettikten sonra insaniyete bir hizmet edilmiş olmaz. Anadolu'da Fransa himayesindeki mekteb, hastahane, emakin-i diniye gibi müessesâtın kâffesi misyonerlerin zîr-i nezaret ve idarelerine tevdi' edilmiş olduğu ve bâdema da istenildiği zaman ve mekânda müceddeden tevsîatın müsaadeli tanınması, şerait-i sulhiyeden bulunduğu cihetle, buna istinaden Fransız papaslarının cehl-ü gaflette bulunan insanları, ya "bu dini kabul edin, dediğimizi tutun" gibi tahrik ve teşviklerle muhakeme-i vicdaniyelerinden inhiraf ettirecekleri veya kabul etmeyenleri imha için kendi taraftarlarına, "Katolik olmayanların mal ve mülkü helâldir, hususiyile hâmîmiz Fransa'dır, darb ve tahkîr edin, tarziye ve tazminat diğer taraftan yani mağlub ve muhakkar olan cihetten verilir" gibi nahak ve nameşru sözlerle, asırlarca kardaş ve hemşehri yaşamış anasır-ı muhtelif arasına nifak tuhmunu maa ziyadetin serpecekleri şübhesizdir.

Ecnebler, Garb'da mazhar olamadıkları müsaadât ve imtiyazâtın kâffesi-

(130) Keldanî: Mezopotamya asıllı bir Hristiyan topluluğu.

(131) Kapitülasyonlar: Bir ülkede o ülkenin ve o ülke insanlarının zararına olarak yabancılara verilen haklar ve ayrıcalıklar. Fransızcadan Osmanlıcaya geçen "kapitülasyon" sözcüğü genellikle çoğul olarak "kapitülasyonlar" biçiminde kullanılırdı. Osmanlıcada "kapitülasyonlar"a ayrıca, "yabancıların ayrıcalıkları" demek olan "imtiyazât-ı ecnebiye" de denilirdi.

ni Şark'ta elde etmiş olduklarından, ahalî-i Müslime maruz olduğu esaret ve isaeti kayıdsızlıkla görerek, yalnız Hristiyan olan unsurları hürriyet ve medeniyete îsal ümid-i muğfili ile teşvik etmekten ve bu suretle edyan-ı muhtelifeye mensub akvam arasına büyük bir rekabet-i nifakkârî ilka eylemekten hiç bir zaman boş kalmamışlardır.

Misyonerler, gerek müesseselerinde ve gerekse mahall-ı sairede âlûde-i fikr-i nifakları olmuş insanları daima Avrupa'nın nazar-ı dikkat-ü rikkatini celbedebilecek vak'aları ihdasa tahrik ve sevk edip, bittabî bu tarîkle hecemât ve savelâta uğrayan anasır-ı hakime zillet-ü hakarete tahammül getirmeyerek, bidayeten def'i saıl ve sonra da tevsî-i kıtal ve tahribatta cahilâne ve mağrurane devam ettiklerinden, sahaif-i matbuât ve mahafil-i siyasyede mes'ûliyeti pek o kadar haklı olmayarak üzerlerine alıyorlar. İyice tedkik edilsin; Kürdistan'da ve sair cihetlerde siyaset noktasından vukua getirilmiş fazayihın ilk sahnelerinde misyonerlerle bunların meftun-ı fikir ve fatanetleri olan ahalînin bir kısm-ı masumu görülmektedir; ki bu kuvve-i muhacimenin icraat ve ifadesi, kâmilen âsûdeğ-i gaflete bürünmüş ve bilhusus hükümet-i zalime-i Hamidiyenin en tahammülgüdaz bar-ı cebr-ü itisafı altında inlemekte bulunmuş olan ahalî-i İslâmiye aleyhine tevcih edilmiştir. Tab'ı beşer daima intikama meyyal bulunduğundan, ikinci sahne, Kürdlerin ve sair anasır-ı İslâmiyenin gerek Kürdistan'da ve gerekse payitahtta Ermeniler aleyhine kıyam ve hareketleriyle hitam bulmuştur. Sebebsiz hücum ve tahrib olamayacağı ve kaide-i külliye olmak üzere hücumu maruz olanlar da sahife-i muhakmeden uzak bulundurulamayacağı malum olmasına göre, esas-ı nifak ve cinayetin ne olduğunu araştırmak tabîidir.

Kürdistan'a misyonerlerin duhulünden, Rusya ve Fransa konsoloslarının menafi-i ticariye ile iştiğal yerine Hristiyan ahalîye kıyam ve ihtilâli telkîne başlamazdan evvel ne Kürdistan'da, ne da sair cihetlerde hiç bir Ermeninin burnu kanamadığı gibi, umur-ü muamelât-ı ticariyeyi taht-i inhisara alacak derecelerde kendilerine umum tarafından bir emniyet-i kâmile verilmiş ve hatta bugün Osmanlılıktan bîzar tanınan Rusya'nın muharebât-ı maziyesinde Kafkasya hududunda büyük bir geçidi, vaktiyle Timurlenk'le gelerek Sıvas'ta kalmış olan bir unsur-ı İslâmîdan yani Karatatar aşiretinden daha kahramanane müdafaa etmişlerdi.

Bu gibi ahval-ı maziye ve hakayık-ı tarihiye beş-on senelik nifak ve ihtilâllerle unutulurak, Ermenileri son ferdine kakadar mahv-ü itlâf, hangi dine mensub olursa olsun hiç bir kavmin mizac-ı takdirîsine tevafuk edemeyecek garaibdendir.

Zaten son zamanlardaki vak'alarda en ziyade zarardîde olan ecnebi tebaa yüzünden hükümet-i Osmaniye-i âcizeden musırran taleb ve istihsal edilen tazminatın mevzuları da tedkik edilse, tahakkuk eder ki hecemât-ı müntakımaneyi kendilerine bir kuvve-i anilmerkeziye gibi cezb eden, misyonerler müesseseleridir. Sebebsiz intikam alınmaz.

(Mâbâdı var)

ZIYA-İ AZİM

Serfirazan-ı ahrar-ı Osmaniyeden, yar-i mukaddes ve muhteremimiz, Diyarbekirli İshak Sükûtî Efendi, milleti, vatanı maruz kaldığı tehlikeden istihlas fikr-i gayretperveranesiyle ittihaz ettiği meslek-i âlâm ve meşakkatı neticesi olarak giriftar olduğu illetten ruhayâb olamayıp, İtalya'da vaki San Remo şehrinde teslim-i ruh eylemiştir. Rahmetullahi aleyhi rahmeten vasiaten.

Merhum, cemiyet-i ahrara(132) hakikaten hidemât-ı mühimmede bulunmuştur. O zalim, gaddar hafiyeler arasında harikulâde bir zekâ ve cesaretle maksadına bütün akranından ziyade îfa-i hizmete muvaffak olurdu. Fıtratında merkûz zekâ, vefa, fütüvvet, cesaret gibi mahasın-ı ahlak, bütün ecanib nezdinde dahi kendisini en mümtaz bir mevkide bırakmıştır. Bin beş yüz frank maaşla İtalya Sefareti tababetini kabul etmekle kendisini itham etmek isteyen bazı erbab-ı hased nezdinde dahi malumdur ki merhumun kabul ettiği o memuriyet, öteden beri takib eylediği meslek-i hamiyetperveranesine devam edebilmekten başka bir sebebe mübtenî değil idi. Kendisinin daima sefalet içinde yaşaması ve mustağrık-ı düyun olarak vefat etmesi, buna pek büyük bir delildir. Hasılı, İshak Sükûtî merhum, cidden milletimiz için tazmini müşkil zayıâtandır. O, milleti için can verdi. Millet de bugün onun yad-ı haziniyle eşkrîz-i derd-ü elemidir.

İntikam Matbaasında tab'olunmuştur

(132) Cemiyet-i ahrar: Özgürlükçüler topluluğu, özgürlük için çalışanların oluşturdukları topluluk. Bu topluluktan maksat, İshak Sükûtî'nin de kurucuları ve aktif üyeleri arasında yer almış olduğu "İttihad ve Terakkî Cemiyeti"dir. Buna göre ve "cemiyet" sözcüğü aynı zamanda "dernek" anlamında da kullanıldığı için, "cemiyet-i ahrar" sözcükleri, "Özgürlükçüler Derneği" anlamında da kullanılabilir ve o takdirde sözcüklerin baş harfleri büyük olarak şöyle yazılır: "Cemiyet-i Ahrar". Maksat yine "İttihad ve Terakkî Cemiyeti"dir. Yani "özürlükçülerin oluşturdukları dernek".

30'UNCU SAYININ ÇEVİRİLERİ

KÜRDİSTAN'DA NİFAKIN TEMELİ

Riyakârlık ve insanlık perdesine bürünmüş olan Cizvit papaslarının,(133) Avrupa'nın değişik yörelerinde yolaçtıkları bozgunculuk ve bölücülükler dolayısıyla hemen hemen her ülkeden kovuldukları halde, gerek Uzakdoğu'da ve gerekse Doğu'da(134) ve özellikle de Okyanus adalarında etki ve zorbalığı tekellerine aldıkları, kanıtlanmış gerçeklerdendir. Asıl maksatları, bilgisiz ve dünyadan habersiz olarak yaşayan türdeşlerini(135) dinin sırlarından haberli kılmayarak kendi despotluklarının ve zorbalıklarının pençesinde ezmek ve böylece emek ürünlerini zerre kadar yorulup zahmete katlanmaksızın, akıl sır ermeyen hazinelerinde toplamaktan ibarettir. Bu tip din görevlilerinin Osmanlı ülkesinde insanlık ve uygarlık adına meydana getirdikleri kötülükleri anlatmadan önce, haklarında daha kesin ve açık bilgiler verebilmek isteğiyle, barınılan toprakların en uzak köşelerinde çevirmekte oldukları bozgunculuk ve çıkarıcılık dolaplarını ayrıntılı biçimde anlatıp açıklamak, herhalde yarasız sayılmaz.

Çin'deki çarpışmaların misyonerlerin kışkırtmalarıyla meydana geldiği ve sonucun da yalnız onların keyfî çıkarlarına uygun biçimde karara bağlandığı, birçok yazar tarafından yazılıp durmaktadır. Örneğin bu çarpışmalarda olayları saptayıp yazmakla resmî görevli olarak bulunmuş olan Baron Bazankor,(136) "Çin ve Kuşanşin Çarpışmaları" adıyla yazdığı eserde, "göksel hükümetin(137) kapılarını kesintisiz biçimde sarsan iki müthiş düşmandan biri, ticarî çıkarlarının güvence altına alınması için İngiltere tarafından yapılan maddî baskı, öbürü de Fransa'nın koruması altında yapılan ve sürüp giden dinsel yayınlardır" girişiyle başladığı sayfalarda, misyonerlerin insanlığı çiğneyen ne çıkarıcılıklar ve alçaklıklar yapmakta olduklarını açıklıyor. Fransız generellerinden Waro'nun(138) raporu da bu açıklamaları aynen ve zincirleme olarak onaylamaktadır:

(133) Bu sayıdaki 122 numaralı dipnota bakınız.

(134) Buradaki "Doğu"dan maksat, Doğu ülkeleridir.

(135) Türdeşler: Aynı türden gelenler, aynı türden ve kökenden olanlar. Burada maksat, insanlardır. "Türdeşler" sözcüğü, yazının aslındaki "hemicinsler" sözcüğünün karşılığında kullanılmıştır.

(136) 20. sayıdaki 9 numaralı dipnota bakınız.

(137) Bu sayıdaki 124 numaralı dipnota bakınız.

(138) 20. sayıdaki 9 numaralı dipnota bakınız.

”Çin’de halkın değerli mallarını ve eşyasını ilk yağma ve talan eden ve bu alanda askerlere öncülük eden, misyonerlerdir. Onlar uzun süre Pekin’de oturdukları için, altın külçelerinin konulmuş oldukları bankaları biliyorlardı. Kuşatma kalkar kalkmaz askerlerimizi kendileri sevk ettiler ve Hristiyan dinine girmelerini sağladıkları Çinlileri de yanlarına katarak en gizli köşeleri araştırttılar. Bu Çinliler, misyonerlere yardım ederek ve gasp ettikleri ya da çaldıkları malları dinî liderlere teslim ederek, Allah katında hayırlı ve kutsal bir iş yaptıklarına inanıyorlardı.

İşte bizim askerlerimiz ve denizcilerimiz, bu sayede zengin oldular. Değerli şeyleri yerlerinde satarak, Pekin’de aldıkları büyük tutarlı çeklerle Fransa’ya dönen bu yağmacılardan birisinin yolda ölmesi, birçok gizli şeyin meydana çıkmasına yardım etti. Çarpışmaların bitmesinden sonra Fransa’ya dönen askerî birliklerden birine bağlı bu erin ölümü sonunda olağan olduğu gibi kâğıtları araştırılırken, Fransa’da ödenmek üzere Pekin Piskoposu Fawye(139) tarafından imzalı, 60 bin franklık bir çek çıktı. Bu sayede, hak yolu göstermek amacıyla kandırıcı yayınlarda bulunan papasların, Çinlilerin haklarına ve zenginliklerine saldırdıklarından başka, askerlerde ve genel olarak bütün insanlarda var olması en gerekli olan haktanırılığı ve dolayısıyla erdemli ahlakı bozdukları, bu durumları görenlerin gözünde tümüyle belirgin bir duruma geldi”.

Okyanus adalarındaki despotlukları ve bozgunculukları Uzakdoğu’dakinden daha fenadır. Oralarda yaşayan zavallıları emir ve yasaklarına bayağı mahkûm etmekte ve toprağı feodalite dönemindeki zorbalık ve şiddetin daha müthiş bir yöntemiyle işletmekte oldukları, Jorj Peren(140) adındaki incelemeci yazarın raporları ile pekişmekte ve onaylanmaktadır.

*

Bu girişlere yer vermekten maksat, Avrupa’nın çoğu hükümetlerinin topraklarından öfke ve nefretle kovulan misyonerlerin, dünyanın öbür bölgelerine bozgunculuk kıvılcımları gibi yayıldıklarını anlatmak ve insanlık adına, uygarlık adına hareket eden Avrupa hükümetlerinin siyaset ve nüfuzlarının ellerinde kanunsuz bir müdahale ve çıkar aracı olduklarını açığa çıkarmaktır. Misyonerlerin, Tanrı’nın kullarına zarar vermek konusundaki yanlış tutumları, kendi dindaşları ve vatandaşları tarafından göz önüne alındığı halde, Avrupa’dan başka yerlerdeki insanlar arasında kargaşalıklar çıkarmak doğrultusundaki akılsızca düşünceleri, yine o vatandaşların parlamentolarında, genel ve özel konferanslarda saklayamadıkları, basınının her gün açığa vurduğu dosyalardan ve kanıtlardan ortaya çıkmaktadır. Böyle olunca da, Yüce Devlet(141) ile Fransa arasında, oluşmuş rıhtımlar anlaşmazlığının ve

(139) 20. sayıdaki 9 numaralı dipnota bakınız.

(140) 20. sayıdaki 9 numaralı dipnota bakınız.

(141) 28. sayıdaki 125 numaralı dipnota bakınız.

başka anlaşmazlıkların misyonerlerin çıkarına uygun olarak, Osmanlı şeref ve şanını çığneyici biçimde, aşağıda yazılı beş madde ile 10 Kasım'da son bulmuş olması, Kürdistan'ın geleceği açısından pek tehlikelidir:

1- Osmanlı topraklarındaki var olan Fransız okullarının yasal varlıklarının tanınması ve yürürlükteki antlaşma ve yasalar gereğince gümrük vergisinden bağışlanmasının geçerli tutulması.

2- Fransız hastaneleriyle dinsel yapılarının yasal varlıklarının tanınması ve yine yürürlükteki antlaşmalar ve sözleşmeler gereğince arazi ve gümrük vergilerinden bağışık tutulması.

3- 1894, 95, 96 yıllarında Osmanlı ülkelerinin değişik yörelerinde ve İstanbul'da meydana gelen Ermeni olaylarında yıkılan ya da zarara uğratılan Fransız okullarının, hastanelerinin ve dinsel yerlerinin yapım, onarım ve genişletilmelerine müsaade edilmesi.

4- Fransa hükümetinin gelecekte gereksinime göre oluşturmak isteyeceği kurum ve kuruluşların genişletilme, yapım ve onarımlarının başlangıcından itibaren altı ay içinde Osmanlı hükümetince şayet kuşkuyu gerektirecek bir şey duyulmayacak ve itiraz edilmeyecek olursa, bu girişimlerin de kendiliğinden müsaadeli sayılıp geçerli kılınması.

5- Keldanî(142) patrikliğine seçilmiş olan Emanuel'in dinsel görevinin Fransa'nın arzu ve istemi doğrultusunda kabul edilip onaylanması.

Fransa'nın, kapitülasyonların(143) kabul ettirilmesinden beri Doğu'da izlediği siyasal ve dinsel tutumun Kürdistan'la ilgili işler konusunda öngördüğü müdahalelerin gelecekte daha müthişlerinin meydana getirileceğini açıkça kanıtlayan bu beş maddenin hemen hemen her noktasından, Katolikliğe ve misyonerlere son derece sahip çıktığı ve bunların koruma altına alındıkları duyulup anlaşılmaktadır.

Vicdan özgürlüğünün genellikle geçerli olduğu bu uygarlık çağında, Uzakdoğu ve Okyanus adaları gibi dinsel müdahalelere ve tartışmalara karragâh ve geçit olan vatanımızda da Cizvitlerin, bir deniz gücünün aracılığıyla yöredeki kanunların üstüne çıkarılmaları, üçüncü maddede belirtilen, 1894 tarihinde başlamış korkunç vuruşmaların bundan böyle daha şiddetli biçimde zavallı Doğu halkına zorla musallat kılınacağını üstü kapalı olarak anlatmaktadır.

Fransa'dan kovulan misyonerler, başka yerlerde bozgunculuk yaptıktan sonra insanlığa bir hizmet yapılmış olmaz. Anadolu'da Fransa'nın korumasındaki okul, hastane, dinsel yerler gibi kurum ve kuruluşların tümü misyonerlerin denetim ve yönetimi altına verilmiştir; bundan böyle de istendiği zaman ve istendiği yerde bunların yeniden genişletilmesinin müsaadeli olarak tanınması, barış koşullarındandır. Bu nedenle, buna dayanan Fransız papaslarının, bilgisizlik içinde bulunan dünyadan habersiz insanları, ya "bu dini kabul edin, dediğimizi tutun" gibi kışkırtmalar ve özendirmelerle vicdanî

(142) Keldanî: Mezopotamya asıllı bir Hristiyan topluluğu.

(143) Bu sayıdaki 131 numaralı dipnota bakınız.

düşüncelerinden saptıracakları, ya da kabul etmeyenleri ise imha etmek için kendi yandaşlarına, "Katolik olmayanların mal ve mülkü helâldir, özellikle koruyucumuz Fransa'dır, vurun ve hakaret edin, özür dilemek ve tazminat ödemek karşı tarafa yani yenilgiye ve hakarete uğratılan tarafa düşer" gibi haksız ve kanunsuz sözlerle, yüzyıllarca kardeş ve hemşehri olarak yaşamış olan değişik unsurların arasına nifak tohumunu fazlasıyla serpecekleri kuşkusuzdur.

Yabancılar, Batı'da elde edemedikleri müsaade ve ayrıcalıkların tümünü Doğu'da elde etmiş olduklarından, Müslüman halkın uğradığı tutsaklığı ve kötülüğü umursamazlıkla görerek, yalnız Hristiyan olan unsurları özgürlük ve uygarlığa kavuşturmanın kandırıcı ümidiyle teşvik etmekten ve böylece değişik dinlere bağlı halkların arasına nifak sokucu büyük bir rekabet sokmaktan hiç bir zaman boş kalmamışlardır.

*

Misyonerler, gerek kurum ve kuruluşlarında ve gerekse başka yerlerde nifakçı fikirlerine bulaşmış olan insanları, her zaman Avrupa'nın dikkatini ve merhametini çekebilecek olaylar çıkarmaya kışkırtıp itiyorlar. Böylece saldırılara ve şiddete uğrayan egemen unsurlar, küçük düşürülmeye ve hakarete uğramaya dayanamayarak, başlangıçta saldırıyı püskürtürler ve sonra da vuruşmayı ve yıkımı bilgisizce ve böbürlenerek sürdürdüklerinden, gazete sayfalarında ve siyasal çevrelerde pek o kadar hak etmedikleri biçimde sorumluluğu üzerlerine alırlar.(144) İyice gözden geçirilip incelenir; Kürdistan'da ve başka yörelerde siyasal açıdan meydana getirilmiş olan kötülüklerin ilk sahnelerinde misyonerlerle onların fikirlerine ve zekâlarına tutkun olan halkın masum bir bölümü görülmektedir. Bu saldırgan gücün eylemleri ve sözleri, tümüyle aymazlık rahatlığına bürünmüş olan ve özellikle Sultan Hamid'in zalim hükümetinin tahammül gücünü en büyük ölçüde yok eden şiddet ve baskısının yükü altında inlemekte bulunan Müslüman halka karşı yöneltilmiştir. İnsan yaratılışı her zaman öç almaya eğilimli bulunduğundan, ikinci sahne, Kürdlerin ve öbür Müslüman unsurların gerek Kürdistan'da ve gerekse başkentte(145) Ermenilere karşı ayağa kalkmaları ve harekete geçmeleriyle son bulmuştur. Nedensiz saldırı ve yıkım olamayacağı ve genel kural(146) olduğu üzere saldırıya uğrayanlar da yargılama sayfasından uzak bulundurulamayacağı bilindiğine göre, nifak ve cinayetin temelini ne olduğunu araştırmak doğaldır.

Kürdistan'a misyonerlerin girmesinden, Rusya ve Fransa konsoloslarının ticarî çıkarlarla uğraşacakları yerde Hristiyan halka ayaklanma ve kargaşalık

(144) Yani "gazete sayfalarında ve siyasal çevrelerde sorumlu duruma düşerler, sorumluluk onların üzerinde kalır, onlar sorumlu gösterilirler" demek istiyor.

(145) Buradaki "başkent"ten maksat, Osmanlı başkenti olan İstanbul'dur.

(146) Buradaki "genel kural" sözcükleri, Arapça olan ve Osmanlıca bir hukuk terimi olarak kullanılan "kaide-i külliye"nin karşılığında kullanılmıştır.

çıkarmayı öğütlemelerinden önce ne Kürdistan'da, ne de başka yörelerde hiç bir Ermeninin burnu kanamadığı gibi, ticarî işleri ve işlemleri kendi tekelleri altına alacak ölçülerde çoğunluk tarafından kendilerine eksiksiz bir güven verilmişti. Hatta, bugün Osmanlılıktan bezmiş olmakla tanınan Rusya'nın geçmiş savaşlarında Kafkasya sınırında yer alan büyük bir geçidi, bir zamanlar Timurlenk'le birlikte gelerek Sivas'ta kalmış olan Müslüman bir unsurdan yani Karatatar aşiretinden daha kahramanca savunmuşlardı.

Bu gibi geçmiş durumlar ve tarihsel gerçekler beş-on yıllık nifak ve kargaşalıklarla unutulurken, Ermenileri son bireylerine kadar yok ve telef etmek, hangi dine bağlı olursa olsun hiç bir halkın değerbilir karakterine uygun düşmeyecek garipliklerdendir.

Zaten son zamanlardaki olaylarda en çok zarar gören yabancı uyruklar yüzünden güçsüz Osmanlı hükümetinden ısrarla istenip elde edilen tazminatın konuları da incelense, şu gerçek ortaya çıkacaktır ki, öç alıcı saldırıları kendilerine bir merkezkaç güç(147) gibi çeken, misyoner kurumlarıdır. Nedensiz olarak öç alınmaz.

(Devamı var)

(147) Merkezkaç güç: Bir merkez çevresinde hareket eden bir cismi o merkezden uzaklaştıran güç. Bir fizik terimi olan "merkezkaç güç", yazının aslında kullanılan "kuvve-i anilmerkeziye" teriminin karşılığı olarak kullanılmıştır. Arapça olan ve Osmanlıcada bir fizik terimi olarak kullanılan "kuvve-i anilmerkeziye", öyle anlaşılıyor ki burada yanlışlıkla "kuvve-i cazibe" teriminin yerinde kullanılmıştır. Çünkü "kuvve-i anilmerkeziye" terimi, Türkçe karşılığı olan "merkezkaç güç"ten de anlaşılacağı gibi, "cismi merkezden uzaklaştıran güç" demektir. Oysa burada, misyoner kurumlarının öç alıcı saldırıları kendilerine çektikleri anlatılmaktadır. Bunu belirten terim ise Osmanlıcada "kuvve-i cazibe"dir, Türkçe karşılığı da "çekim gücü"dür.

BÜYÜK KAYIP

Osmanlı özgürlükçülerinin yücelerinden olan kutsal ve saygıdeğer dostumuz Diyarbakirli İshak Sükûtî Efendi, milleti ve vatanı uğradığı tehlikeden kurtarmak fikir ve gayretiyle tuttuğu acılı ve yorucu yolun sonucu olarak yakalandığı hastalıktan kurtulamayıp, İtalya'da yer alan San Remo kentinde ruhunu teslim etmiştir. Allah'ın geniş rahmeti, üzerine olsun.

Rahmetli, özgürlükçüler topluluğuna(148) gerçekten önemli hizmetlerde bulunmuştu. O zalim, gaddar gizli polisler arasında olağanüstü bir zekâ ve cesaretle, bütün benzerlerinden daha çok amacına hizmet etmeyi başarmıştı. Yaratılışında bulunan zekâ, vefa, mertlik ve cesaret gibi ahlak iyilikleri, bütün yabancıların yanında dahi kendisini en seçkin bir konumda bırakmıştı. 1500 frank maaşla İtalyan Elçiliğinin doktorluğunu kabul etmekle kendisini suçlamak isteyen bazı kıskançlarca dahi biliniyor ki, rahmetlinin kabul ettiği o görev, öteden beri izlediği yurtseverce tutumunu sürdürebilmekten başka bir nedene dayanmıyordu. Kendisinin sürekli olarak yoksulluk içinde yaşaması ve borçlara boğulmuş olarak vefat etmesi, buna pek büyük bir kanıttır. Özetçe, rahmetli İshak Sükûtî, milletimiz için gerçekten telâfisi güç kayıplardandır. O, milleti için can verdi. Millet de bugün onun hazin anısıyla dert ve acı gözyaşlarını döküyor.

(148) Bu sayıdaki 132 numaralı dipnota bakınız.

Sahib

ve

Muharriri:

Bedirhan Paşaoğlu

Abdurrahman

KURDİSTAN

1315

Heyvê carekê derdikeve
cerîdeya Kurdî yeKürdleri tahsil-i ulûm ve fûnûna
teşvik eder

nasayih ve edebiyat-ı

Kürdiyeyi hâvî

ayda bir neşrolunur

Kürdçe ve Türkçe gazetedir

KÜRDİSTAN

Gazetenin mesleğine muvafık

Arabça, Farişî mektublar

aynen derc olunur

Adresse:

"KURDİSTAN"

GENÈVE

(Suisse)

*

*

Derc

olunmayan

evrak

iade

olunmaz

Kürdistan haricinde

her yer için

senelik abone bedeli

80 kuruştur

Kürdistan dahilinde

hususî isteyenlere

meccanen gönderilir

Duşemb 6 Muharrem sene 1320 * 1 Nisan sene 1318(1)

QONGRE

Berî salekê lawên Mehmûd Paşa îlan kir ku wê mu'temerekê teşkîl bikin.(2)
Ev wada wan lawa, gelek xelq memnûn kir. Zîra(3) eve hew qas sal e hinde
mirovê mêr nav welatê xwe de û nav welatên Ewropayê de hinde dixebitin,
eve hew qas eyam e(4) gelek semere îqtîtaf nekirin.(5) Em hemî, întîzara(6)

- (1) Li gora tarîxa Mîladî 14 Nîsan 1902(Milâdî tarihe göre 14 Nisan 1902).
- (2) Mu'temer: Kongre, civîna giştî.
Teşkîl bikin: Pêkbînin, vêkxin.
- (3) Zîra: Lewra.
- (4) Hew qas eyam e: Ew qas zeman e, ew qas dem e.
- (5) Semere: Ber, fêkî.
Îqtîtaf nekirin: Neçinîn.
- (6) Întîzar: Payin, rêpan, çavnêrî, ku mirov tişteke bipê û çavnêrîya wî tiştî bike, rîya wî tiştî bipê.

wê wadê wan lawa bîn. Axir berî du heyva, wan encalên(7) Mehmûd Paşa Sebahedîn Beg û Lutfullah Beg hatin Parîs, dawetname li gelek ehrarên Osmaniye(8) re rêkirin. Ehrar hemî li Parîs îctîma' kirin.(9) Sala Efrencî(10) hezar û neh sed û duyê(11) de li Parîs mu'temer teşekkul kir.(12) Em çil aza(13) hebîn. Ew miletên hukumeta me teşkîl dikin, Muslim û xeyrê Muslim ji hemîya du-sê aza hebîn. Ji qongreyê esil meqseda me ew bû ku çî qas ehrar hene hemî îttîfaq bikin û meqseda xwe ya eynî re(14) hemî ji yek rê biçin, da rojekê ewiltir nailê emel bibin.(15)

Me şeş jara(16) îctîma' kir. Lakîn ew çil aza ku meqseda wan hemîya yek bî, muzakeratên(17) wan şeş îctîmaa de zeman hemî bi mucadela efkara û hetta munaqesata bûrî. Ewan aza, neylê emela xwe re(18) întîxaba tedabîra de(19) ji hevdu cuda man. Mu'temer bi du para înqîsam kir.(20) Esbabê înqîsam yek nuqte bî, ew nuqte jî teleb û ya redkirina mudaxela ecnebîya bî.(21)

*

Ez'ê nuho ji sûretê teşekkul û dewama mu'temerê bikim:(22)

Mu'temer li binê riyaset(23) Sebahedîn Begê de îctîma' kir. Çihar madde ji meqamê riyaset wez'ê mewqîê muzakere bî.(24) Ji derba ewil(25) gelek mudafeat û mutaleat tewellud kir.(26) Lakîn ji naehlîya(27) wanên cem'iyet(28)

-
- (7) Encal: Piranîya "necl" e, ew jî bi mana "kur, law, pis" e.
(8) Ehrarên Osmaniye: Azadîxwazên Osmaniyan.
(9) Îctîma' kirin: Civîyan, kom bûn.
(10) Efrencî: Mîladî.
(11) Duyê: Diduyan, 2'yan.
(12) Teşekkul kir: Pêkhat.
(13) Aza: Piranîya "uzw" e, ew jî bi mana "endam" e.
(14) Meqseda xwe ya eynî re: Ji mexseda xwe ya yek ra, ew mexseda wan a ku eynî ye û yek e, ji wê mexseda xwe ra.
(15) Nailê emel bibin: Bigîjin daxwaza xwe.
(16) Şeş jara: Şeş caran. Wîsa tê zanîn ku peyvika "car" bi şaşî "jar" hatiye çapkirin.
(17) Muzakerat: Piranîya "muzakere" ye, ew jî bi mana "peyvîna tevayî, hevpeyvîn" e.
(18) Neylê emela xwe re: Ji gîhana daxwaza xwe ra, jibo gîhana daxwaza xwe.
(19) Întîxaba tedabîra: Bijartina tedbîran.
(20) Bi du para înqîsam kir: Li du beşan belav bû, li du beşan cuda bû, bû du beş.
(21) Teleb û redkirina mudaxela ecnebîya bî: Daxwaz û vegerandina têkilîya bîyanîyan bû. Yanî "beşek daxwaz dikir ku dewletên bîyanî têkilê kar û barên dewleta Osmanî bibin û jibo sazkirina rejîmeka têrazadî bibin alîkar, beşek jî ev dîtîna vedigerand û li dijî têkilîya bîyanîyan derdiket".
(22) Yanî "ez'ê nuha ji awayê pêkanîna û domkirina kongreyê behs bikim, qala wê bikim".
(23) Riyaset: Serokî, serekî.
(24) Wez'ê mewqîê muzakere bî: Di cîyê peyvîna tevayî da hatibûn danîn; hatibûn pêşkêşkirin, da ku li ser wan peyvîna tevayî bihata kirin.
(25) Ji derba ewil: Ji cara pêşîn ve, ji despêkê ve.
(26) Mutaleat: Piranîya "mutalee" ye, ew jî bi mana "dîtîna, ray" e. Tewellud kir: Welidî, peyda bû, çêbû.
(27) Naehlî: Nehêgîni, bêkêrî.
(28) Cem'iyet: Civîna.

